
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1188 21-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Hejmara nû ya kovara Jinên Ciwan ên Welatparêz derket



Hejmara meha Tîrmeh û Tebaxê ya Kovara Jinên Ciwan ên Welatparêz bi berga "Bi xweparastinê ber bi rêxistinbûnê ve, bi ruhê pêngavê ber bi serkeftinê' ve derket.

Hejmara meha Tîrmeh û Tebaxê ya Kovara Jinên Ciwan ên Welatparêz bi berga "Bi xweparastinê ber bi rêxistinbûnê, bi ruhê pêngavê ber bi serkeftinê' hat weşandin.

Kovara ku mijara xweparastinê girtiye dest, behsa pêwîstiya pêvajoyê ya ji bo jinên ciwan dike û her wiha berxwedan û ruhê pêngavê dihûne.

Kovara Jinên Ciwan ên Welatparêz, erkên pêvajoyê bi perspektîfên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên ji bo jinên ciwan ronî dike û bi nivîsên cuda yên dosyayê bala xwendekaran dikşîne.

Di beşa portreyan de li ser jiyana yek ji fermandarên ewil ên gerîla şehîd Mîhrîban Saran (Azîme) tê sekinandin û di beşa îdeolojiyê de jî cih dide nivîsên Zîn Meletiyê.

Kovara Jinên Ciwan ên Welatparêz, Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê û Pêngava 15'ê Tebaxê bi rengekî xurt dinirxîne, wê bi hejmarên xwe yên nû weşana xwe berdewam bike.

## Qonaxa destpêkê ya avakirina muzexaneyê bi dawî bû

**Qonaxa destpêkê ya avakirina muzexaneya belgekirina sûcên li dijî gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi dawî bû.**



Desteya Çand û Şûnwaran a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 2'yê Adara 2024'an de dest bi avakirina muzexaneyê kir, da ku sûcên li dijî gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di dema serweriya çeteyên DAIŞ'ê de û sûcên dewleta Tirk a dagirker, bên belgekirin. Qonaxa destpêkê ya avakirina muzexaneyê ji aliyê derve ve 4 mehan dom kir.

Desteya Çand û Şûnwaran dê qonaxa duyemîn di çend rojên pêş de dest pê bike. Di wê qonaxê de dê muzexane ji aliyên hundirîn ve bê tamîrkirin, wêne, alav û delîlên sûcên çeteyên DAIŞ'ê belge dikin, li muzexaneyê bên pêşandan.

Muzexane li kêlek Parka Îstîqlalê (Serxwebûn) ya li taxa Îstîqlalê ya li beşa bakurê Reqayê ye. Di avahiya wê de qermîd hatin bikaranîn. Dirêjahiya muzexaneyê 16 metre û kêmberiya wê 4,5 metre ye.

Muzexane ji 3 beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de folklora herêmê ji cihên rûniştinê û alavan heye, beşa duyemîn ji bo pêşandana fotografên sûcên li dijî xelkê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatine kirin û di beşa sêyemîn de pêşangeha peykerên biçûk ên cihên şûnwarî yên li Herêmê hene.

Li gorî hevseroka Desteya Çand û Şûnwaran a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Serfiraz Şerîf armanc ji avakirina muzexaneyê belgeyî, pênaseyî û vegotina bûyerên li herêmê qewimîne.

Şerîf wiha got: "Dê muzexane bibe şahidê wan sûcan û bêdengiya cîhana derve li hember sûcên li dijî pêkhateyên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye." **ANHA**

## Dilsoz Resûl bi tabloyên xwe êşa Kurdan û zehmetiyên jinan nîşan dide

**Navenda Nûçeyan**



Jina şêwekar Dilsoz Resûl bi firçeya di destên xwe de êşa Kurdan û zehmetiyên jinan dixe nava tabloyan û nîşan dide. Dilsoz got: "Ez tu demê bê hêvîtî li jiyanê temaşe nakim, hêviyê didim jinan û hertim zemînekê ji bo keyfxweşî û heskirinê dihêlim."

Şêwekar Dilsoz Resûlî ji zarokatiya xwe de keyfa wê ji çêkirina wêne û tabloyan re hatiye, li gor wê reng û tablo dikarin peyamek baş bidin mirovan. Ji bo wê ew hertim hewl dide bi rêya xêzkirina wêneyan peyamên cûda yên jinan bigihîne civakê.

Dilsoz Resûl (42) li navçeya Koye hatiye dinê, beşa şêwekarî li Peymangeha Hunerên Ciwan a Silêmaniyê qedandiye û li Silêmaniyê dijî. Heta niha bi wêneyên xwe tevlî 46 pêşangehên hevbeş ên şêwekariyê bûye.

Wek Dilsoz dibêje, ji zarokatî de heskirina wê ji karê çêkirina wêneyan re hebû û di sala 1990'an de bi çalakiyên li dibistanê tevlî cîhana wênesaziyê bûye. Piştre jî li peymangehê beşa şêwekarî qedandiye û niha jî ew dixwaze bi rêya tabloyan xeyal û cîhana xwe bi awayek hunerî nîşan bide. Dilsoz Resûl diyarkir ku wê li hindir û derveyê Kurdistanê tablo û wêneyên xwe nîşandaye û heta niha tevlî 46 pêşangehên hevbeş ên şêwekarî bûye.

Di derbarê astengî û zehmetiyên di jiyana wê ya hunerî de derketine jî Dilsoz Resûl got: "Tevî ku li Başûrê Kurdistanê dest bi ser azadiyên jinan de hatiye girtin û bûne asteng ji bo jin bi xwesteka xwe kar bikin, lê min kariye bi piştgiriya malbata xwe hemû astengî û zehmetiyan derbaskim. Ez ti demê bêhêvîtî li jiyanê temaşe nakim, hêviyê didim jinanê û hertim zemînek ji bo keyfxweşî û heskirinê dihêlim."

Dilsoz da zanîn ku divê jin astengiyên li pêş xwe rakin, ber bi armanca xwe ve bimeşin, xwezayîbûna xwe biparêzin û wisan bikarin serkeftinê bidestbixin.

Di dawiyê de jî Şêwekar Dilsoz Resûl got: "Ez dixwazim bi hunera xwe nîşanî civaka Kurd bidim ku hêzekin, xwedî kêrhatinên xwe yên taybetin û dikarin li ser lingên xwe bisekinin."



bi kamîreya Hemza Sêvo

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji malê ye:**
- Em li hev biste ne; em ji hev fedî nakin.

**Kenê bêaran tê ji qulên dîwaran:**
-Kesê ji xwe şerm neke bi her tiştî dikene.

**Kenê bêariyê pê girtiye:**
- Bi heman wateyê.

**Kirasê şermê ji ber xwe kiriye:**
- Mirovekî bêşerm e; çi tê ber devê wî dibêje; rûyê wî ji ti kesî naêşe; rûşûştî ye.

**Li cem bêaran her bihar e:**
- Xema tiştekî naxwe; ji bo wî tiştek ne derd e.

**Li cem bêşerman her roj dawet e:**
- Bi heman wateyê.

**Mertalê wî rûyê wî ye:**
- Rûyê wî qayîm e; tu çi jê re bêjî şerm nake.

**Ne ji mehna bûya, wê rûvî li sûkan geriyabûya:**
- Rûyê wî pir qayîm e; rûyê wî ji ti kesî naêşe.

**Nemerdî nekir:**
- Şerm nekir; bi bisteyî tev geriya.

**Perdeya rûyê wî qetiyaye:**
- Bêşerm e.

**Pişta guhê wî şil nebû:**
- Şerm nekir; çawa ku ne wî ew karê xirab kiribe; li ber xwe neket.

**Pisîk di pêsîra wî re derbas dibe:**
- Bestûka kirasê wî vekiriye; şerm nake kirasê bestûkvekirî li xwe dike. (18)

**Qûna xwe ji derpê derxistiye:**
- Kiryarên wî yên şermê ne.

**Rûyê beqê ji ava golê şil nebe/ji tifa te şil nabe:**
- Ji bo kesê bêşerm tê gotin.

**Rûçarox e:**
- Birû ye; rûyê wî qayîm e; bêşerm e.

**Rûqayîş e:**
- Bi heman wateyê.

**Rû jê standiye:**
- Jê fedî nake.

**Rûreşo parîxweşo:**
- Kesê ji xwesteke şerm neke wê hin tiştan bi dest bixe.

**Rûşûştî ye:**
- Bêşerm e; çi tê ber devê wî dibêje.

**Rûyê wî ji çermê berêz e:**
- Birû ye; rûyê wî qayîm e; bêşerm e.

**Rûyê wî ji çermê kerê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Rûyê wî qayîm e:**
- Şerm nake; bêşerm e; tu çi jê re bêjî li ber xwe nakeve.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'YPJ'ê Pêşenga Şoreşa 19'ê Tîrmehê Ye'



Fermandara YPJ'ê Gulbihar Kobanê diyar kir ku bi rihê şoreşa 19`ê Tîrmehê ew ê dagirkeriyê têk bibin, serkeftinê mesoger bikin û got:"YPJ`ê wê ti carî soza ku daye jin û gelan ji bîr neke û herdem ew ê dilsoza doza azadiyê be."**R-2**

## Malbatên şehîdan: Şoreşa Rojava şoreşa azadiyê ye

**Malbatên şehîdan diyar kirin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo gelên bindest şoreşa azadiyê bû, bi saya felsefeya Rêber Apo, keda şervanên azadiyê û xwîna şehîdan destkeftiyên giranbuha hatin qezenckirin. Herwiha malbatên Şehîdan tekez kirin ku ew ê hertim li ser şopa şehîdên heqîqet û azadiyê têbikoşin.R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1188 21-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ BI PÊŞENGIYA JINÊ WÊ TACÎDAR BIBE

Li dijî pergala netew-dewlet ku dixwaze mirovahiyê bi giştî û bi taybet jinê kêlî bi kêlî ber bi tunebûnê ve bibe. Şoreşa Rojava weke şoreşa jinê derkete pêş, vê şoreşê pêşketinên mezin bi xwe re anî û ji tevahî mirovahiyê re bû mînak. Di 19'ê Tîrmehê de ev çirûsk ji Kobanê destpêkir û belavî tevahî Rojava û Sûriye bû. Şoreşa Rojava ku jinê tê de rola pêşengtiyê lîst, îro ji bo hemû jinên cîhanê jî bûye roniya hêviyê û sembola azadiyê.**R-3**












## 'PDK'e gelê Başûrê Kurdistanê radestî dewleta Tirk dike'

**Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya PDK û hikumeta Îraqê di 3'ê Tîrmehê de dest bi valakirin û şewtandina gundên Başûrê Kurdîstanê kir. Endamê Konseya Rêveber ya KNK'ê Kamîran Berwarî diyar kir ku armanca dewleta Tirk ji êrişên ser Başûrê Kurdistanê avakirina xilafeteke nû ye.R-4**



## Gerîla derbeyên giran li dagirkeran dide



Gerîlayên Azadiya Kurdistanê li Geverê, Metîna û Zapê çalakî lidar xistin. Di çalakiyan de 5 leşkerên Tirk ên dagirker hatine cezakirin, 2 çeper û mobesseyek hatin îmhakirin.**R-3**

## Dildara huner û wêjeya zarokan; Rona Egîd



Rona Egîd keçeke 15 salî ye, ji 6 saliya xwe ve xebata hunerî dike. Di heman demê de ji wêjeya zarokan hez dike û gelek stranên zarokan gotine. Herwiha xwediya pirtûkxaneyek taybet a zarokan e û bi vîn û dildariyeke mezin xebatekê di Kovara Rona de dide meşandin.**R-7**

# ‘YPJ’ê Pêşenga Şoreşa 19’ê Tîrmehê Ye’

Fermandara YPJ’ê Gulbihar Kobanê diyar kir ku bi rihê şoreşa 19`ê Tîrmehê ew ê dagirkeriyê têk bibin, serkeftinê mesoger bikin û got:”YPJ`ê wê ti carî soza ku daye jin û gelan ji bîr neke û herdem ew ê dilsoza doza azadiyê be.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di nava şoreşa Rojava de Yekîneyên Parastina Jin YPJ’ê berxwedaniyeke lehengî li hember êrişên çeteyên DAIŞ’ê, dewleta Tirk a dagirker û komên çeteyên din ku hewl dan Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dagir bikin, nîşan dan. YPJ’ê bi pêşengiya jinên Kurd xwe di hemû bajaran de bi rêxistin kir, paşê ji gelek pêkhateyên din bi taybetî jinên Ereb tevlî nava refên YPJ’ê bûn. Hêzên YPJ’ê dîroka bi hezaran salan a jinan ji nû ve zindî kir û careke din bi hêza xwe dikaribû hebûna jinan ji tevahî tarîtiyê xilas bike. Îro YPJ’ê mohra xwe li dîroka jinan daye û bûye îlham ji tevahî jinên Rojhilata Navîn û cîhanê re. Bi rasthatina salvegera Şoreşa Rojava 19`ê Tîrmehê Fermandariya Yekîneyên Parastina Jin YPJ Gulbihar Kobanê ji Rojnameya me re axivî.



**‘Bi saya ramanê Rêber Apo hêza jin xurt bû’**

Gulbihar Kobanê diyar kir ku di şoreşa 19’ê Tîrmehê de jin di hemû qadên jiyanê de kesayeta xwe îfade kir û hêza xwe derxiste holê û wiha got: “Di 2011_2012`an de salên herî dijwar bûn ku li tevahî cîhan û bi taybet jî li Rojhilata Navîn hatin jiyîn. Pêdiviya jin û gelan ji hemû deman zêdetir bi şoreşekê wiha dirokî hebû. Rêber Apo her dem peywirên dîrokî da ser milên jinan, di şoreşa rojava da jî jinê giringiya vê bi awayekî pir şênber dît û bi vê zanebûna xwe ji parastina jin û gelan berpirsiyar dît, ji bo vê yeke jî heta dawiyê bû xwedî ked. Helbet şoreş bê berdêl çênabin, di hemû şoreşên gelan de berdilên giran hatine dayîn, lê şoreşên ku pêk hatine nekarîbûne xwe ji têkçûnê biparêzin, ango nekarîn xwe bighînin armancên xwe yên sereke. Bi navê gel rabûn, lê tu berjewendiyên ji bo gel nehatin bidestxistin, banga azadiyê hate kirin, lê pergaleke nû ya bindestiyê hate ava kirin. Lê belê Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê bi ronahiya ramanên Rêber APO ev 30 sal e têkoşîna hebûnê, xwebûyîn û azadiyê didin meşandin. Li ser heman mîrasê jî bi zanebûna jin dikare hebûna xwe biparêze. Şoreşa 19`ê Tîrmehê bû şoreşa jinan. Di sedsala 21`an de jin bi erkên xwe yên demê rabûn û bi rengê xwe di nava şoreşa Rojava da hêza sereke û pêşengtî leyist.”



**‘YPJ`ê karîbû ku destkeftiyên hemû jinan bi cih bînê û biparêze’**

Gulbihar di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “YPJ’ê di 4’ê Nîsana 2014’an da bi awayekî fermî xwe îlan kir, bi heqîqeta ku wê bikarê berpirsiyartiya tevahî jinên ku di bin serweriya hişmendî û desthilata baviksalarî da mane rabikê, jinan ji vê zordariyê rizgar bikê, têkoşîna azadiya jin û gelan da meşandin. Her wiha bi avabûna Yekîneyên Parastina Jin YPJ’e re Jina Kurd careke din xwe ispat kir ku dikare ji hebûna tevahî jinên cîhanê re jî pêşengî bike û ev yek jî bi pêşveçûnên Şoreşa Rojava û bandora wê ya li ser tevahî cîhanê zêde kir. Ger îro li seranserê Rojhilata Navîn û cîhanê hemû jinên azadîxwaz çarenûsa xwe di nava refên YPJ’ê û Şoreşa Rojava da dibînîn û bangawaziya xilasiya xwe ji YPJ’ê re dikin, ev bi saya berdêlên giranbuha yên ji aliyê jinên wêrek yên YPJ’ê ve hatine bidestxistin e. Ji ber YPJ’ê di nava van 12 salên Şoreşa Rojava da xwe îspat kir, ku dikarî bû soza parastina destkeftiyên hemû jinan bi cih bînê û biparêze.”

**‘YPJ`e dikarîbû di hemû aliyan de pêşengtiyê bike’**

Gulbihar da zanîn ku hebûna jin di nava şoreşê da bi serê xwe şoreşa azadiya jinê ye û wiha got: “YPJ`ê soza misogeriya jiyana hemû jinên cîhanê wekî erka xwe ye bingehîn dibînê û li ser vî bingehê jî têkoşîna azadî û wekheviyê dide meşandin. YPJ`ê bi pêkanîna erkên xwe yên azadî û demokrasiye re, ji bona azadiya gelan û jinan xwe feda dike. Di nava şoreşê de milîtanên jin ên wekê hevrê Silava Efrîn, Rêvana Rojava, Arîn Mîrkan, Barîn Kobanê, Avesta Xabûr, Jiyan Tolhildan û Sosin Bîrhatan, bûn sembolên pêkanîna soza azadiya tevahî jinên cîhanê. Bi pêşveçûnên şoreşê re şervan û fermandarên YPJ’ê karîbûn xwe di hemû aliyan de bi zanist bikin û di warê siyasî, diblomasî û leşgerî ve ji tevahî jinan re pêşengtiyê bikin. Ji ber hêza YPJ’ê bi vê hişmendiyê ber bi Şoreşa Jinê ve gavên dîrokî avêt û bû çavkaniya civaka azad û demokratîk. Her wiha milîtanên azadiya jinê bi şerê xwe yê li hemberî terora DAIŞ`ê, di warê bîrdozî û leşgerî da îradeya ku ji mirovahiyê re nîşanda û ispat kir.”

**‘YPJ`e wê herdem dilsozê doza azadiyê be’**

Fermandara YPJ’ê Gulbihar Kobanê di dawiha axaftina xwe de balkişand ser jinên Ermen, Suryan û Aşûr yên ku êdî dikarin mafê xwe yê parastinê bikarbînin û di nava pergala parastinê de xwe bi cih bikin û xwe bi rêxistin bikin û wiha domand: “Ev tê wateya ku YPJ’ê misogeriya jiyana hemû jinan e. Bi vê rastiyê re girêdayî ji bo tevahî jinên Bakûr û Rojhilatê Suriyê bikaribin hebûna xwe mayinde bikin, pêwîste xwedî li hebûn û mafê xwe yê azadiyê derbikevin. Ji bo vê jî xwe di warê bîrdozî û parastinê de xûrt kirin ku destkeftiyên şoreşa jinê biparêzin. Her wiha jin êdî bi zanebûna şoreşa Jin, Jiyan, Azadîyê re dikarin wateya hebûna xwe gerdûnî bikin. Dîsa şoreşa ku jinan di oxira wê de berdêlên giran dayê, di warê terz û taktîkê da ezmûnên mezin qezenc kiriyê. Rihê fedayî ji bo xwe esas girtiye, ji ber wê jî ew ê ti carî soza ku daye jin û gelan ji bîr neke û wê her dem dilsozê doza azadiyê be. Her wiha bi rihê şoreşa 19`ê Tîrmehê emê dagirkeriyê têk bibin û serkeftinê misoger bikin.”

# Aboriya jin derfetên cur bi cur ji bo jinan ava dike

**Aborî yek ji stûnên ku civak xwe dispêrin û pê jiyana xwe didomînin e. Aboriya Jin ya Tirbespiyê ji bo jin derbara xwe bikin gelek projeyan cur bi cur pêş dixe.**

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re şêniyên herêmê hewl dan xwe di her alî de bi pêş bixin bi taybetî di aliyê aborî de. Her wiha jinan bi taybetî jî hewl dan sûdê ji vê şoreşê bigrin û di wê warî de xwe bi rêve bibin. Aboriya jin; li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yek ji wan saziyên ku roleke girîng di pêşxistina aboriya herêmê de û bi taybetî jinan de dilîze ye. Derfetên kar ji gelek jinan re çêbûn ku aboriya xwe ya taybet bi riya projeyên curbecur û berhemdar ava bikin.

**Ji bo gundan projeyên biçûk hene**

Ji bo zanîna girîngiya aboriya jinan û projeyên ku li navçeya Tirbespiyê ya girêdayî bajarê Qamişlo rêvebera aboriya jin de Lema Xelîl got: “Ev sazî kar li ser pêşxistina jinan di aliyê aborî de dike û derfetên kar ji wan re peyda dike. Projeyên me yên niha firin û projeyên komînal ên biçûk li gundan in. Ji wan nanê sêlê û tenûrê ye her wiha projeyên çandiniyê jî hene. Di her projeyê de sîstemeke hundirîn heye ji bo kar baştir were kirin.”
Her wiha got: “Armanca van projeyan avakirina aboriyeke taybet ji bo jinan e ji bo ku alîkariya malbata xwe û xizmên xwe bikin. 4 projeyên nan li Tirbespiyê hene. Projeya çandiniyê li gundekî nêz jî heye ku 20 jin tê de kar dikin. Jin li wê derê bi tena xwe bêyî alîkariya tu kesî erdên xwe û diçînin û berhemên xwe radikin.”

**‘Divê jin tu carî dest ji karê xwe yê çandiniyê bernedin’**

Lema Xelîl di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Divê jin dest ji karên xwe yên çandiniyê bernedin û xwe bi pêş bixin, ji ber ku gaveke girîng e. Her dem em diçin serdana komînan, ji bo em hinek jinên dixwazin di projeyan de kar bikin bibînin. Her wiha carna em pêşniyarên jinan der barê projeyên nû de digrin û li ser kar dikin da ku weke gaveke kar ji bo wan be. Çend ji projeyên herî daxwazkirî yên ji me tên xwestin li herêmê



projeyên çandinî dirûtin, dikanên şêraniyê her wiha firinên nan û kulîçeyan in. Her wiha em hewl didin alîkariya jinên ku sewalan li gundan xwedî dikin bikin bi riya vekirina projeyên taybet. Wekî din jî em hewl didin bazaran ji jinên ku berhemên şîr difroşin re vekin ji bo parastina wan ji sermaya zivistanê û germa havînê bikin.” Der barê zehmetiyên bi wan re derdikevin de jî wiha got: “Karînên me hindik in û cihên taybet jî teng in ji ber wê, pêşî li girtina hejmarek baş ji jinan digre.” **NÛ JINHA**



# Dildara huner û wêjeya zarokan; Rona Egîd

Rona Egîd keçeke 15 salî ye, ji 6 saliya xwe ve xebata hunerî dike. Di heman demê de ji wêjeya zarokan hez dike, gelek stranên zarokan gotine. Herwiha xwediya pirtûkxaneyek taybet a zarokan e û bi vîn û dildariyeke mezin xebatekê di Kovara Rona de dide meşandin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê, zarokên ku di temenê biçûk de ji wêjeyê hez dikin, xebata hunerî dikin hem jî ji bo pêşxistina çanda xwendin û nivîsîna kurdî kar dikin, ji ber sedemên curbecur kêmpeyda ne, ji van zarokên wisa jî Rona Egîd e.

**Jiyana Rona Egîd**

Ew keçeke bi temenê xwe 15 salî ye, li Amûdê di sala 2009’an de ji dayik bûye. Ew zarokeke ji destpêka ku bîrewer bûye, hezkirya hunerê ye. Ji refa yekê heya niha bi kurdî xwemdina xwe didomîne, qonaxa seretayî li dibistana Şerîf Redî bi dawî kiriye. Herwiha piştre xwendina navîn li dibistana Zehraa domandiye li gor ku Rona diyar kir, ew îsal li ser refa 9’an a dibistanê xwe asta yekê serkeftî derket. Ew niha gihaştiye qonaxa amadehî ji xwendina xwe. Hem bi wêjeya zarokan ve mûjûl dibe, hem ji stranan dibêje û hem jî pirtûkxaneyeke wê taybet ji bo zarokan heye. Di heman demê de Rona Egîd ji warê



bazirganiyê hez dike û hêviya wê ew e di pêşerojê de bibe derçûya beşa bazirganiyê û hem jî xebata hunerî û wêjeyî jî bike.

**Evîndariya wê ji hunerê re**

Rona Egîd di temenê 6 saliyê de ji stranan hez dikir, wê cara yekem strana Tehsîn Taha ya bi navê Bêrîvanê li Bûyer FM gotiye û qeyd kiriye. Piştre jî wê û hunermend Ridwan Kenio du kilîp li ser zimanê kurdî û Cejna Newrozê amade kirin. Di sala 2015’an de jî bi wî temenê xwe yê biçûk li ser dikeya şahiyekê strana Ez Şah im Delala Min gotiye. Hem jî bi gelek starnbêj û hunermendên kurd yên navdar stran gotine. Hêjayî bi bîrxistinê ye jî ku di zarokatiya xwe de mijûlî xebata sînemayê bûye. Rona di 8 saliya xwe de beşdarî fîlmê Bêdeng yê ku li ser zarokên Efrînê ye, bûye. Herwiha beşdarî fîlmê Cîranê bû, Rona di wî fîlmî de jî rola keça penaber dilîst. Di warê hunerê de, Rona sazbend e û li ber destê çend muzîkjenên tembûrê fêrî amûra tembûrê bûye. Tevî ku temenê Rona biçûk bû lê tembûr hilgirt destê xwe û xwe pêş xist, lê ji ber xwendina xwe û kêmvalabûnê dûrî tembûrê ket.

**Pirtûkxaneya Rona**

Rona Egîd bi nivîsînê û wêjeyê ve girêdayî ye, bi taybet wêjeya zarokan, hertim armanca wê ew e ku zarok xwe di warê nivîs, xwendin û rewşenbîriyê de pêş bixin. Di heman demê de destekdayîna Rona ji zarokên ku hewla wan heye xwe pêş bixin, hertim amade ye. Li gor ku Rona ji me re got ku ew destpêkê tevlî Pêşangeha Herekol a Pirtûkan a çaremîn bûye, wê gelek çîrok û pirtûkên zarokan bi reiya pirtûkxaneya Amara beşdar kirine. Piştî wê jî berşdarî gelek pêşangeh û çalakiyên wêjeyî bûye. Heya ku bû 9’ê sala 2021’ê, Rona pirtûkxaneyek bi navê xwe vekir. Ev pirtûkxane bi taybet ji bo zarokan e, pirtûkxaneyeke biçûke lê di nav xwe cîhaneke ji wêjeya zarokan û hizir û xeyalên zaroktiyê tê de dihewîne . Ji ber ku pirtûkên hildigire nava xwe, çîrok, roman û helbestên zarokan, fêrkrina ziman û hwd… in. Ev pirtûk bi zimanê kurdiya kurmancî û soranî, zimanê erebî û inglîzî ne, hejmara wan nêzî 300 navnîşanî ye. Li gor ku Rona da zanîn, hejmara pirtûkan di demên borî de ji wiha bêhtir bûn, lê di pêşangega de hatin belavkirin. Rona ji bo me eşkere kir ku rêjeya zarokên ku tên pirtûkxaneyê û yên ku pirtûkan dibin pir kêm e. Tevî wiha jî hewildanên Rona hene ku hejmara pirtûkan ji wisa pirtir bike û şaxên din li bajarên Rojava jî bide vekirin.

**Kovara Rona**

Rona projeya xwe ya kovara zarokan kir hizreke bingehîn û pirojeyek ronak ji bo pêşxistina çand û wêjeya zarokan. Sedema vê projeyê berî ku dest bi projeya kovarê bike hewl da ku projeya xwe bi rengekî nû bide destpêkirin. Çi ji hêla dîzaynê, çi ji hêla reng, kaxez, stîl û mijarê ve. Rona Egîd xwest roja weşana hejmara yekê bike rojeke dîrokî, ku heman roja weşana yekem a kovara kurdî ji zarokan a bi navê Gir û Galî Mendalanî Kurd. Ev kovar ku di 21’ê Nîsana 1946’an de li Komara Mahabadê yekem car ji bo zarokan hatiye çapkirin. Helbet armanca Rona bi vê kovara ku mehane derdikeve ew e ku bipêşxistina wêjeya zarokan û kovargeriya zarokan li Rojavayê Kurdistanê geş bibe. Rona ji bo me da destnîşankirin ku ev kovar ji hêla rêxistineke civakî bi navê Hêl Kurdistan dihat palpiştkirin û vê rêxistinê destek dida kovara Rona. Lê niha Rona, bavê xwe û tîma wê kovarê bi rê ve dibin, Rona da zanîn ku heya niha 5 hejmar hatine derxistin, berî niha bi hezaran hejmar dihatin çapkirin, lê ji ber pirsgirêkên madî hejmara derxistin û çapkirina hejmarên kovarê kêm bûye.

# Kampa Til El-Semin: Konên ku veguherîne mozayîka pêkhateyan

**Koçberên kantona Girê Spî ya dagirkirî ku Kurd, Ereb û Turkmen li gel hev di kampê de dijîn, çadirên xwe veguherandine mozayîkeke ku bajarê wan temsîl dike.**

Erdîngariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêkhateyên xwe yên cihêreng dewlemend e ku Kurd, Ereb, Ermen, Turkmen, Çerkez, Aşûr û Sûryan li gel hev dijîn. Ev pêkhate bi salane ji aliyê Rêjîma Baas ve rû bi rûyê polîtîkeyên pişaftin û qirkirinê hatin. Bi şoreşa 19’ê Tîrmehê re ku xwe dispêre paradîgmeya Netewa Demokratîk ya di nava xwe de hemû pêkhate bi reng, çand, ziman û nasnameya xwe komî gel hev dike, derfet li pêşiya hemû pêkhateyan vebû ku ji berê bêhtir danûsitandin, hevdû naskirin û pejirandin çêbibe. A niha mirov dikare Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke mûzayîka gelan bi nav bike, ji ber ku di gelek bajaran de jiyana komînal a pêkhateyên herêmê weke wêneyeke şênber xwe dide der.
Yek ji herêmên ku bi 4 pêkhateyan tê nasîn, kantona Girê Spî ya girêdayî herêma Firatê ye ku li ser axa wê Kurd, Ereb, Ermen û Turkemen bi hev re dijîn. Niştecihên Girê Spî ku ji 2012’an de pêvajoyên êrîşên Artêşa Azad, Cebhet El-Nûsra



û Çeteyên DAIŞ’ê jiyankirin. Di 15’ê Pûşbera 2015’an de ji aliyê Yekîneyên Parastina Jin û Gel (YPJ/YPG) di çarçoveya pêngava şehîd Rûbar tê rizgarkirin ku Girê Spî weke kanton tê raghandin û bi sîstema Rêveberiya Xweser ya Demokratîk tê birêvebirin.
Girê Spî ji aliyê erdîngarî ve weke herêmeke biçûk tê nasîn, lê ji aliyê civakî û çandî ve ewqas dewlemend e ku dema mirov di kolanên wê re dimeşe ew cudabûna ziman, reng û çandan dibîne. Ji gundê Hemam El-Turkmen û girê Zelba, tax û dêra Ermenan bigre, navçeya Silûk û kaniya Eyn Arûs, ew hevgirtina di navbera pêkhateyên wê de dibîne û dikare analîzeke wiha bike ku yekîtiya çar pêkhateyên wê dibîne. Bi dagirkirina Girê Spî re Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampa Til El-Semin a girêdayî bajarê Reqa yê ava kir. Ji bo naskirina rewşa koçberên Girê Spî ku heta mirov dikare bêje, heman wêneya ku pêkhateyan li warê xwe xêzkirbûn, derbasî kampê jî kirin. Bi gotineke din mirov dikare bêje, civakbûn û komînalbûna ku li Rojhilatê Navîn xwe parastiye, li kampan jî tê jiyîn û teysandin.

**Bêhna bi kombûna li gel hev derdikeve**

Mircan Hecî Ibrahîm ku bi eslê xwe Kurd e wiha dibêje: “Me li gunedwarên kantona Girê Spî jiyandikir, bi dagirkirinê re em neçar man ku koçber bibin. Ji ber dewleta tirk bê navber welatên kantonê hedef digirt û bajar bombebaran dikir. Wê demê gelek kes hatin qetilkirin û sedan birîndar ku zarok, jin û ciwan jî birîndar bûn. Ev 4 sal in em di kampê de dijîn, bê guman koçberî gelek dijwar e, lê ya ku sebira me tîne kombûna me ya li gel hev e. Em weke gelê Girê Spî bi tevahî pêkhateyên wê a niha bi hev re jiyan dikin û cudabûna di navbera me de xwe nade der. Beriya vê jî em li gel hevbûn, lê bi nêrîna min hevgirtina di kampê de bihêztir bû û me zêdetir hevdû naskir.”
Sîstema kampan diyar in ku her çadirek di ber ya din de ye. Ji ber vê bi rengekî xwezayî mirov dikare pêwindiyeke bihêztir li gel cîranên xwe ava bike. Dema ku em di nava kampê de geriyan, ya herî zêde bal dikşîne ku Turkemen, Kurd û Ereb di nava cîrantiyeke xûrt de ne ku heta fêrî zimanê hev jî bûne. Ji ber em niha jî di pêvajoya amedekariyên xwarina zivistanê de ne ku jinan bi dest û zendên xwe dimisa îsota û firengan, reçel, miloxî, tirşo û hwd çêdikirin. Jinan civat li derdora hev komdikirin û bi rengekî komînal alîkariya hev dikirin ku di ber kar re behsa bîranînên xwe yên Girê Spî û hêviyên vegera li welatekî azad bilêv dikirin. Di demsala Zivinstanê de û dema ku baran dibariya gelek çadir di bin avê de diman, jinên kampê bi hev re ew çadir paqij û sererast dikirin. Zarok jî di nav hevaltiyeke hevbeş de bûn, ku bi hev re diçûn dibistanê, li mal û derve jî dilîstin. Zarokên kampê ku di nava şert û mercên dijwar de dijîn, kenê li ser lêv û dilgermiya wan di her kêliyê de xwe dide der.

**Warê xwe di çadiran de ava kirin**

Meha Mele ku ji pêkhateya Turkmen e teqez dike ku ewê bi hevgirtina xwe Girê Spî ji nû ve ava bikin: “Mala min li Hemam El-Turkmen bû ku em weke Turkmen lê dijiyan, lê danûstandinên me bi pêkhateyên din re jî hebû. Bi koçberiyê re hemû şert û mercên jiyana me hatin guhertin, lê ew hevgirtina xwe parast. Raste em di çadiran de ne, lê yê ku serdana kampê bike wê hîs bike ku derbasî Girê Spî bûye. Ji xwe welat bi gelên xwe ava dibin, ne bi avahiyan e. Ji xwe dema ku Girê Spî rizgar bibe, emê vê wêneyê ku me di kampê de avakir derbasî bajarê xwe jî bikin û ji şopên dagirkeriyê paqij bikin.”
Ev çar sal in ku niştecihên Girê Spî ya dagirkirî di kampa berxwedanê de dijîn, tevî vê yekê jî mirov coş û bendewarên ku dê rojekê de vegerin malên xwe zindî û diyar e.

# Ji bo parastina mirov û civakê perwedeyên destwerdana destpêkê tên dayîn

Ji şaxên perwerdeyê yên girîng, dîtina perwerdeyên tenduristiyê ye. Ev xebat xwedî girîngî û pêwîstiyeke sereke ji civakê re ye. Li herêma Şehbyê ji aliyê Desteya Tenduristiyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê pewredeyên tenduristî yên mudexeleya yekem ji gel re tê dayîn.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Di rewşeke weke rewşa ku gelê Efrînê li herêma Şehbayê tê de jiyan dike, yek ji girîngtirîn pewerdeyên pêwîst ji civakê re; perwerdeyên tenduristiyê yên wekî destwerdana destpêkê ye. Desteya Tendurististitiyê li herêma Şehbayê,ji destpêka derbasbûna gelê Efrînê ji herêmê re ev erk girtiye ser milê xwe û perwerdeyên tenduristiyê dide gel. Girêdayî xebatên perwerdeyê yên qada tenduristiyê, endamê Koordînasyona Desteya Tenduristiyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Talet Welo ji rojnameye me re axivî.



**Ji erkên bingehîn xurtkirina perwerdeyan e**

Talet di destpêkê de bal kişand ser girîngiya perwerdê û insiyatîfên ku hatine kirin û wiha pê de çû: "Bi derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, ji erkên me yên sereke bûn ku em xebatê perwerdê di herêmê de bidin destpêkirin. Ji bo civakeke ku rojane rasrî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê tê bê guman ev gav pêwîst bû ku bê pêşxistin. Di heman demê de ji girîngtirîn encamnameyên konferansa Tenduristiyê hatiye derketin xurtkirina perwerdeyên destwerdanên yekemîn di nava civakê de bû. Li ser wê bingehê di vê warî de gelek dewreyên girtî û vekirî di nava ciwan û tavahî gel de bi tensîq bi meclîs û komînan re hatin vekirin."

Talet girêdayî perwerdeyên ku hatine vekirin wiha got: "Perwedeyên ku tên dayîn ji aliyê kadroyên taybet yên tenduristiyê û bi sînevizyon û şîrovekirinên xurt tên dayîn. Herî dawî dewreyek li ser asta navçeya Fafînê bi tevlîbûna 63 ciwan û jinên ciwan hate orgenîzekirin. Ev dewre bi avakirina girûpên destwerdana yekemîn di rewşên awerte de hate bidawî kirin. Bê guman hevalên ku bi serkeftî ji van perwerdeyên tên derketin li gorî pêwîstiyên qada tenduristiyê li cihên guncav tên erkdarkirin."

**Li gorî bîlancoya ku Desteya Tenduristiyê ji sala 2020 heyanî 2024 diyar kiriye, dewreyên hatine dayîn wiha ne:**

Li navçeya Ehresê 4 dewre, hejmar 90 kes. Navçeya Fafînê 5 dewre, hejamar 260 kes. Navçeya Şêrawa 4 dewre, hejmar 230 kes. Til Rifet 5 dewre, hejmar 250 kes. Navçeya Ehdas 5 dewre hejmar, 300 kes. Kampa Berxwedan 2 dewre, hejmar 70 kes. Kampa Serdem dewreyek bi tevlîbûna 50 kesî.

Talet di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Wê di demên pêşiya me de perwerdeyên taybet yên destekdayîna pîskeolojî ji aliyê akîbên pispor ve bên dayîn. Her wiha wê ev perwerdeyên tenduristiyê û Ambolancê wê li ser tavahî asta herêmê bi giranî bêne xurtkirin".

# Li Qamişlo kirîn û firotina xanûberan kêm bûye

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

**Ji ber kirîza Sûriyê bi giştî, herwiha dorpêç û êrişên ser herêmê tevgera kirîn û firotina xanûberan pir kêm bûye. Herwiha nirxê kirîn û firotinê yê bilind jî bandoreke neyênî li bazar kirîn û firotina xanûberan kiriye.**

Ji destpêka aloziya Sûriyê ve û heta niha, gelek pirsgirêkên jiyanî jî rû didin. Ji ber şerê di navbera hikumeta Şamê û komên çeteyan yên çûr bi cûr, gelek bajar, bajarok û gundên li herêmên cûda yên Sûriyê wêran bûn. Ji ber ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê herêma herî ewle bû di tevahiya Sûriyê de, jimareke mezin ji xelkên deverên şer û yên malên wan wêran bûne berê xwe dan herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di Encamê de kirî, kirîn û istismarkirina xanûberan jî buha bû. Piştî êrişên dewleta Tirk li ser Girê Spî , Efrîn û Serêkaniyê û dagirkirina van herêman, gelek ji xelkên van herêman jî berê xwe dan bajarên mezin yên kantona cizîrî wekî Qamişlo û Hesekê, ji ber wê kirê û kirîna xanûberan buhatir bû.

**Rawestandina tevgera kirîn û firotina xanûberan**

Ji ber gef û êrîşên dewleta Tirk a dagirker ser herêmê, herwiha hedefgirtina binesaziya herêmê ji stasyonên xaz, betrol û enerjiyê gelek bandor li tevgera avakirina avahiya kir. Wekî din jî herêm bû şahidê rawestandina kirîn û firotina avahiyan, madeyên avakirinê buhabûn êdî tevgera avakirinê bi giştî jî sekinî, bi sedema êrîş, gef û metirsiya ji dagirkirinê gelek şênî avahiyên xwe bi nirxekî kêm difroşin da ku koçberbibin û cihekî bi ewle bi cih bibin û pêşerojeke baş lêkolîn bikin, ev yek diyardeya îstsmarkirinê zêde dike, nirxê frotinê dişkîne.

**Rawestandina avakirinê**

Yek ji sedemên sekinandina tevgera avakirinê ew e koçberî û kêmbûna hêza kirînê ji hêla derve, ev jî ji ber sedema herî bingehîne ya ne aramiya siyasî li herêmê û metirsiya ji dagirkeriya Tirk ji herêmê re û buhabûna madeyên avakirinê, dema peymankar avahiyan ava dike bi bûhabûna madeyên avakirinê neçar dimîne ku van avahiyan bi nirxekî buha bifroşe, lê ji ber rewşa xirab û zêdebûna xizaniyêli herêmê kirîna malekê dibe xeyaleke ji mirovan re.

Derbarê ve mijarê de hevserokê Yekîtiya Ofîsên xanûberan li Qamişlo Şêxmûs Mihemed, ji bo kirê, frotin û kirîna avahiyan wiha anî ziman: "Bi awayekî giştî tevgera kirîn û frotina xanûberan hatiye sekinandin, wekî din jî kiriya malan pir biha bûye, em weke Yekîtiya Avahiyan çend civînan li dar dixin da ku em qanûneke giştî û nirxekî deynin ji bo kiriya malan û vê zehmetiyê kêm bikin ji bo şêniyên koçber."



Şêxmûs Miheme wiha berdewam kir: "Tevahî Ofîsên Xanûberan gazinan dikin ku kar tune ye, gelek xelk malên xwe rehîne jî dikin da ku derkevin Ewropa ev jî tevgerê disekinîne, dibe ku em nirxê kiriya malan bi giştî bikin yek, em ê hewilkirê bikin ne zêdeyî 50 dolarî be, weke biryar ji bo tevahî şêniyan."

# Xebatên xizmetê yên şaredariya Mexmûrê dewam dikin

**Li wargeha Mexmûrê tevî bê derfetiyan jî kar û xebatên ji bo xizmeta xelkê wargehê dewam dikin. Divê çarçoveyê de hewuzek avjeniyê bûye cihê avjeniya zarok û xelkê wargehê. Encûmenê Şaredariya Mexmûrê Sedîq Kara got; "Ji ber ku gelek kesan di gotin ev ava germavê dermane, me havîna derbazbûyî li kêleka vê bîrê hewuzek çêkiriye û di meha Nîsanê de jî dar çandin."**



Şaredariya Wargeha Penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) tevî kêmderfetiyan jî hewl dide bi xizmetek baş kar û xebatên xwe bikin. Di havîna derbazbûyî de Şaredariya Mexmûrê ji bo avjeniyê hewuzek ya ava germavê ji gel re çêkiribû. Ji bo berfirehkirin û xweşkirina wê qadê, îsal di 4'ê Nîsanê ango Rojbûna Rêber Apo de 500 dar hatine çandin. Têkildarî vê mijarê Encûmenê Şaredariya Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) Sedîq Kara ji ajansa me re axivî.

**'Vir bi dekorek xwezayî hatiye sazkirin'**

Sedîq Kara di destpêka axaftina xwe de balkişand li ser kar û xebatên şardariyê yên ji bo werza havînê tê kirin û wiha got: "Destpêkê ev bîr bi armanca ava vexwarinê hat kolandin, lê ji ber ku ava wê bi asît bû me nekarî em ji bo vexwarinê bikarbinîn. Li ser daxwaza gel me hewuzek ya xwezayî ji bo avjeniyê li kêleka vê avê da çêkirin. Havîna borî xelkê wargehê giştî berê xwe dida ser vê avê. Ji bo wê jî me wek şaredarî çêkirina vê hawuzê erkê xwe dît. Gelek kes ji ber nexweşiyên xwe jî di hatin ser vê avê. Ji ber ku gelek kesan di gotin ev ava germavê dermane, me havîna derbazbûyî li kêleka vê bîrê hewuzek çêkiriye, îsal jî ji meha Nîsanê ve me ev cih ji bo avjeniyê vekiriye. Zarok piranî di demjimêrên germ de tên vir avjeniyê dikin. Me jeneretorek aniye, emê di demjimêrên elektirîka giştî neyî de pêbixin û ava wê di wan demjimêran de jî tê pêxistin. Li vir me hemû derfetên avjeniyê berdest kirine. Me li gorî derfetên xwe vir bi dekorek xwezayî sazkiriye û demjimêrên hatina ser avê ya jin û zilaman diyar kirine. Kesên dixwazin dikarin di wan kêliyan de bên avjeniyê bikin."

**'Mîna daristanekê lêbikin'**

Sedîq Kara di dawiya gotinên xwe de destnîşan kir ku ji bo rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de 500 dar li ser vê avê hetine çandin û wiha got: "Li kêleka vê hewuzê di 4'ê Nîsanê de ango Rojbûna Rêber Apo de 500 şitlên daran hatine çandin. Armanca me ewe ku em vir bikin cihek yên bêhnvedan û rûniştina xelkê wargehê. Me ji bo parastina zarokan û avdana daran dû kes li vir erkdar kirine. Gelek kêmaniyên xwe jî hene em hewl didin bi derfetên xwe van kêm û kûrtiyên heyî jî derbaz bikin û cihek xweş yê bêhnvedanê çêbikin, vir mîna daristanekê lêbikin. Hem cihê heyî berfirehe hem jî ava heyî têrê dike ku em çandinya daran li vir zêde bikin. Armanca me jî ewe ku em vir hîn berfirehtir û xweştir bikin."**Rojnews**



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa vejîna jinê ye

Li dijî pergala netew-dewlet ku dixwaze mirovahiyê bi giştî û bi taybet jinê kêlî bi kêlî ber bi tunebûnê ve bibe. Şoreşa Rojava weke şoreşa jinê derkete pêş, vê şoreşê pêşketinên mezin bi xwe re anî û ji tevahî mirovahiyê re bû mînak. Di 19'ê Tîrmehê de ev çirûsk ji Kobanê destpêkir û belavî tevahî Rojava û Sûriye bû. Şoreşa Rojava ku jinê tê de rola pêşengtiyê lîst, îro ji bo hemû jinên cîhanê jî bûye roniya hêviyê û sembola azadiyê.

**Zana Roj/ Şehba**

Bi destpêka Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bajarê Kobanê re di sala 2012'an de, xeyal û hêviyên gelê me û tevahî gelên herêmê bi cih hatin. Îsbat bû ku şoreş li gorî pîvan û rêgezên şoreşgerî yên nûjen ava bûye. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo avakirina şoreşeke rizgariyê ya civakî, demokratîk a rasteqîn, rêgezên biratiya gelan, jiyana hevbeş esas girt ku şoreşên berê yên klasîk cuda ye. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo guhertin û veguhertina ber bi demokrasiyê ve ezmûneke nû û girîng li herêmê afirand. Ev şoreş bû hêzeke aktîf ku hîna jî di gelek qadan de têkoşîneke girîng raber dike û ji bo parastina mirovahiyê di mercên zehmet de fedakariyên mezin dide. Di serî de çeteyên DAIŞ'ê , gelek hêzên tundraw êrişî şoreşê kirin, şoreş bû hedefa gelek planên komploger ên hêzên navneteweyî û herêmî, di serî de dewleta Tirk a dagirker, hewl dan binyada civakî ya şoreşê têk bibin, xeta wê biguherin û yekitiya hevgirtina gelan tune bikin. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji tevahî çandên exlaqî yên xwedî îradeya azad û rasteqîn û vebijêrkên wê yên durist ên ji stratejiya siyasî ya xeta sêyemîn a projeya çareseriya demokratîk, civakî, exlaq û polîtîk, bi rola jin û ciwanan a pêşengiya şoreşa bihara gelan, bûye dergûşeke civakî ya demokratîk. Di encama vê yekê de zemîneke aktîf û hêzeke xurt a ji bo pêkanîna îstiqrar, çareseriya siyasî ya bi rêya diyalogên nîştimanî yên rasteqîn ava bû. Ruxmî lidarxistina gelek kongre, palatform, civînên navneteweyî wekî Cinêv, Astana û yên dîtir, lê paşguhkirina vê destkeftiya dîrokî ya nûjen xizmeta siberoja çareseriyê li Sûriyeyê nake. Tevahî hewldan ji ber dûrxistina îradeya gelê me û îradeya siyasî ya civakî û projeya çareseriya demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têk çûn. Ev dide nîşandan ku hêza çareseriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji ber vê yekê naskirina vê hêzê girîng e. Li gorî tevahî çareseriyên ku dewletên têkildarî rewşa Sûriyeyê pêşkêş dikin ku berjewendiyên xwe li ser yên tevahî gelên Sûriyeyê re digirin, lê beyannameya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bingeheke nîştimanî ya rasteqîn e ku yek ji projeyên herî girîng ên çareseriya demokratîk e.



Derbarê salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk li Kantona Efrîn û Şehbayê Hêvîn Reşîd ji rojnameya me re axivî.

Hêvîn diyar kir ku destpêkirina Şoreşa Rojava veguherîneke dîrokî ya ber bi pêkanîna demokrasiyê ve ye û wiha got: "Sûriyê bû şahidê tevgereke mezin a gel û serhildaneke ku riya xwe ya pêkanîna azadî û rûmetê guhert, ev jî ji ber destwerdana gelek hêzên derve, di serî de Tirkiyê bû. Van hêzan ji kirîza ku welat tê de derbas dibû, sûd werdigirtin. Hebûna xwe li ser axa Sûriyê dirêj dikirin da ku armancên xwe pêk bînin. Di demeke wisa de şoreşa Rojava dest pê kir û veguherîneke dîrokî bi xwe re anî."

**'Şoreşa guhartin û veguhartinê'**

Hêvîn bal kişand ser destkeftiyên ku şoreşê di hemû qadan de bi dest xistiye û wiha got: "Şoreşa Rojava ji gelek şoreşên berê yên ku pêk hatin cuda ye, ji ber ku şoreşeke li ser esasê guhertin û avakirinê bû, şoreşeke ku daxwazên hemû gelên demokrasî xwaz pêk tîne. Li ser bingeha cihêrengiya çandî, etnîkî û olî, şoreşa jin û ciwanan, şoreşa ziman û gelek destkeftiyên dîrokî ku di van salên dagirtî bi têkoşîn û berxwedanê li ser hemû astan hatine bidestxistin. Heta ku ji bo hemû pêkhateyên herêmê bû bawerî û hêviyek ji bo çûna ber bi rêya demokrasî û têkoşîna hevpar a li dijî zîhniyetên dewletê û hemû zihniyetên ku bi dehan salan ji bo çandina faşîzim, nîjadperestiyê û gurkirina nakokiyên di navbera pêkhateyan de plan didan meşandin."

**'Rola çalak a jinê sedema herî girîng a serkeftina şoreşê ye'**

Hêvîn derbarê rola jin a aktîf di şoreşê de wiha got: "Rêjîmên desthilatdar ên dektator ku welatan bi rêve dibin, ji bo biçûkxistina rola jinan û kûrtirkirina zihniyeta mêrê serdest, xerakirina malbat û civakê bi salane siyasetên xwe dane meşandin. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re herî zêde girîngî hat dayîn ji bo rola jinê û vegerandina nasname û dîroka wê ya rast, xebat hat meşandin, ji ber ku bêyî çareserkirina pirsgirêka jinê û azadkirina wê ti pirsgirêk çareser nabe. Ji ber ku sîstemên desthilatdar qebûl nedkirin ku jin bi rengê xwe, di hemû qadên siyasî, leşkerî û civakî de beşdar bibin. Ji bo guherandina vê zihniyetê, sîstema hevserokatiyê di Rêveberiya Xweser de hat avakirin û yekem model li seranserî cîhanê û serkeftinên şoreşê zêdetir kir."




**Hewildanên hedefgirtina destkeftiyên şoreşê**

Hevîn di axaftina xwe de bal kişand ser planên hedefgirtina destkeftiyên şoreşê û herî zêde êrîşên dewleta Tirk a dagirker û polîtîkayên wê yên li ser herêmê û wiha got: "Ji destpêka şoreşê û vir ve destkeftiyên wê derketine holê. ji hemû rêbazên hedefgirtin û tinekirinê, ji hemû aliyên dijminê îradeya gelan û rêveberiya wan a li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi pêşengiya dewleta Tirk a dagirker ku yek derfetê jî ji bo hedefgirtina herêmê winda nake. û niştecihên wê, û binesaziyê û hemû destkeftiyên ku bi vê şoreşê bi dest ketine armanc dike, ji bo vegerandina herêmê ji berî şoreşê, berdewamkirina pirojeya xwe ya dagîrkeriyê û jinavbirina gelên wê".

Hêvîn bi boneya 12'emîn salvegera destpêkirina Şoreşa Rojava bal kişand ser pêwîstiya berdewamkirina têkoşînê û parastina destkeftiyên şoreşê û wiha got: "Li gorî vê qonaxa hestiyar û dijwar a ku herêmên me tê re derbas dibin, Pêdiviya lezgîn a rûbirûbûna xetereyên êrîş û planên li dijî şoreşa me ye. peyamek ji dijminan re Ji ber vê yekê ev destkeftî ji bo parastina ji metirsiyên êrîşên qirkirinê gelekî pêwîst in, ji ber ku ew destkeftiyên bi têkoşîneke mezin û bi fedekariyên giranbiha yên bi hezaran kur û keçên vê xakê ne, ku bûne qurbanî. ji bo ku em bêhna azadiyê nefes bikin û bi vê minasebetê em soza berdewamkirina têkoşînê û parastina şoreşa xwe careke din nû dikin".

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kantona Efrîn û Şehbayê Hêvîn Reşîd di dawiya axaftina xwe de bang li gelên herêmê kir ku li ser esasê şerê gel ê şoreşgerî li ber xwe bidin. hay ji metirsiyên şerê taybet ku li dijî herêmê tê meşandin û hay ji wan hebe: "Hemû gel û hemû beşên civakê, ku şoreş ji bo wan bû ronahiyek ber bi pêşerojeke demokratîk û azad ve, bi pêwîstiya bilindkirina leza li ser esasê şerê gel ê şoreşgerî, ji bo rûbirûbûna hemû êrîşên dijmin û rêbazên şerê taybet û parastina şoreş û hebûnê ji tunekirinê têdikoşin".

# Gerîla derbeyên giran li dagirkeran dide

**Navenda Nûçeyan**

**Gerîlayên Azadiya Kurdistanê li Geverê, Metîna û Zapê çalakî lidar xistin. Di çalakiyan de 5 leşkerên Tirk ên dagirker hatine cezakirin, 2 çeper û mobesseyek hatin îmhakirin.**

Di derbarê çalakiyên Gerîla yên li dijî artêşa Tirk a dagirker, Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da wiha got:


- Geverê:

17'ê Tîrmehê 3 kamerayên mobesse yên ku artêşa Tirk a dagirker li qadên Gundê Civyan, Şargulata û Gundê Sêgûza yên Geverê bi cih kirî, hatin tespîtkirin û îmhakirin.

- Herêma Metînayê:

19'ê Tîrmehê di saet 20.00'an de bi çekên ferdî û nîv otomatîk li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Dergelê hate xistin. Derb li çeperên dagirkeran hate xistin û 2 çeper îmha bûn. Dagirkeran xwestin mudaxileyî çalakiyê bikin, lê bi rengekî hemwext derbe li 2 çeperên din jî hate xistin. Li vir 2 çeper hatin îmhakirin û 4 dagirker hatin cezakirin.

-Herêma Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl;



17'ê Tîrmehê bi taktîka sekvaniyê mobesseya ayîdê dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, hate îmhakirin.

18'ê Tîrmehê di saet 05.40'an de dagirkeran xwestin kameraya mobesse ya li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî hatî îmhakirin, biguherin. Lê bi taktîka sekvaniyê li dagirkeran hate xistin û dagirkerek hate cezakirin. Ev çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate lidarxistin.

19'ê Tîrmehê di saet 18.00'an de dema ku dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Bahar ketin nav liv û tevgerê, bi çekên nîv otomatîk derbe lê hate xistin û tevgera dagirkeran hate rawestandin.

Êrîşên ku artêşa Tirk a dagirker, bi teqemeniyên qedexekirî pêk anîn:

18'ê Tîrmehê tunelên me yên li Qada Berxwedanê ya Girê FM 2 caran bi teqemeniyên qedexekirî, hatin bombebarankirin.

Êrîşên ku artêşa Tirk a dagirker pêk anîn:

18 û 19'ê Tîrmehê qadên Lolan, Kolît û Şehîd Şerîf ên herêma Xakurkê 9 caran, qadên Avtehlê, Deşta Kafya, Spîndarê, Kanî Gûzê, Girgaşê û Mijê yên herêma Garê 10 caran, Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê û Girê Bahar a herêma Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl 6 caran; bi giştî 25 caran bi balafirên şer hatin bombebarankirin.

20'ê Tîrmehê Qada Berxwedanê ya Girê Bahar a herêma Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl bi helîkopterên êrîşê hatin bombebarankirin."

# 'PDK'e gelê Başûrê Kurdistanê radestî dewleta Tirk dike'

Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya PDK û hikumeta Îraqê di 3'ê Tîrmehê de dest bi valakirin û şewtandina gundên Başûrê kurdistanê. Endamê Konseya Rêveber ya KNK'ê Kamîran Berwarî diyar kir ku armanca dewleta Tirk ji êrişên ser Başûrê Kurdistanê avakirina xilafeteke nû ye.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Erdogan û hevkarên wî li Başûrê Kurdistanê bi rehetî tevdigerin û qadên sivîl jî di nav de, êrişên hovane pêk tîne. Ev yek nîşan dide ku PDK'ê siyaseta parastina dijmin dimeşîne û di xeta xiyanetê de berdewam e. Di rojên dawiyê de dewleta Tirk a dagirker bi hezaran leşker, tang , top, erbeyên zirxî û çekên giran derbasî Başûrê Kurdistanê dike. Herwiha di nava gundên Başûr de bendên kontrolê danîne û heta niha gelek welatî jî binçav kirine.

Derbarê êriş û tevgera dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê, endamê Konseya Rêveber ya Kongra Neteweya Kurdistanê (KNK) Kamîran Berwarî ji rojnameya mere axivî. Kamîran Berwarî diyar kir ku hikûmeta AKP'ê li Başûrê Kurdistanê bi rehetî tevdigere û qadên sivîl jî di nav de, êrişên hovane pêk tîne û wiha domand: "Ev yek nîşan dide ku PDK'ê siyaseta xwespartina dijmin, dimeşîne. Weke berdewama vê siyasetê di van rojên dawî de bi hezaran leşker û bi sedan tank ji Başûr re hatine şandin û her wiha gelek baregehên leşkerî hatine avakirin. Ev erîşên dijwar yên li ser Başûrê KurdIstanê ne cara yekeme, di salên 1980' an heta roja me ya îro êrişên dewleta Tirk berdewam dikin. Di sala 2008'an de gihaşt asteke herî bilind û stratejiyeke nû pilan kirin."

**'Armanca PDK'ê û AKP'ê talankirina xwezaya Kurdistanê ye'**

Berwarî da zanîn ku armanca dew-



leta tirk û hevkarên wê, valakirina Başûrê KurdIstanê û talankirina xwezaya wê ye yê û wiha dirêjahî da axaftina xwe: "Niha şerekî pir dijwar li ser Başûrê KurdIstanê tê meşandin. Enfala sala 1988'an bi ser gel de hatiye, ferqa vê enfalê ji enfalên din tune ye, ji ber ku di enfalên din de rejîma Iraqê erIşî gelê kurd kir, gelê kurd hemû bi yek dengî li sê parçeyên din yê Kurdîstanê li pişta hêzên rizgariya Kurdistanê bû. Sînorê Îran, Suriye û Bakur ji kurdan re vekiribû û kurd diçûn hewara hevdû. Wê demê jî çeken kîmyewî dihatin kar anîn û gund dihatin valakirin û şewitandin. Niha jî Erdogan gundan vala dike û dişewitîne, malê welatiyan talan dike û çekên kîmyawî li herêmê bikar tîne."

**'Iraq xwe li hemberî dewleta Tirk lawaz dibîne'**

Berwarî diyarkir ku gelên Iraqê, bi taybet rewşenbîr, nivîskar û sîyasetmedar ji parlementeya Iraqê daxawz dikin ku helwesta xwe nîşan bide û wiha got: "Ji hikumeta Iraqê tê xwestin ku helwesta xwe nîşan bike. Hikumeta Iraqê her çend beşek ji vê pilangeriya heremî û navxweyî ya li dijî Tevgera Azadiyê be jî, lê wê nikaribe pilangeriya xwe bibe serî û berdewam bike. Ji ber ku Iraq di van sedsalên çûyî de gelek derbên giran ji deste Dewleta Tirk xwerine û ne karî xwedan biryar be û serweriya xwe biparêze. Sedema ku Iraq li hemberî erîşan û dagirkeriya dewleta Tirk bêdenge, ji ber ku Iraq weke dewlet hê jî xwe lawaz dibîne û nikare xwe komî serhev bike. Ger Iraq bixwaze serweriya xwe wek dewlet biparêze, pêwîste deriye Îbrahîm Xelil qapat bike. Dema ku derî hat girtin wê Tirkiye bi milyona dolar zirar bike. Encama bêdengiya Iraqê tê wateya ku pilanên qirêj di navbera Mistefa Kazîmî û Erdogan de heye."

**'Dewleta Tirk li Başûr Kurdistanê çeteyan bikar tîne'**

Berwarî da xuyakirin ku dewleta Tirk gelek çete aniye heremê û di şerê li li dijî Tevgera Azadiyê de wan bikar tîne û wiha domand: "Çeteyên ku li heremê hatinê bicîhkirin, ji sala 2015- 2016'an ve de li Başûrê Kurdistanê bicîh bûne. Ev çend salin li Rojava, Lubnan, UrdIn, Filîstîn, Bakûrê Efrîqa û li Iraqê Jî çeteyên dewleta Tirk hene. Ev aloziyên ku li gelek welatan çêdibin destê çeteyên dewleta Tirk tê de hene. Hemû çeteyên li dunyayê di bin sîwana ser çete Erdogan û hikumeta AKP û MHP ê de kar dikin. Ev beşek ji pilana heremî û cihanî ya komkirina çeteyn li Iraq, Sûriyê û li gelek cîhên din in. Çete bixwe jî bûne bermahiyên siyaseta Erdogan.



Ew dema ku karê xwe bi wan diqedîne, wê demê wan çeteyan hemûyan radestî dewletên wan dike yan jî wan dikuje.
dewleta bike an jî wan bikuje. Hedefa Tirkan ew e ku sînorên Deryaya Sipî heta Zaxo kelaşîn û Rûsyayê hemû bi çeteyan dagire û demografiya heremê bi de guhertin."

**'Pêwîste Iraq bêdeng nemine'**

Berwarî wiha domand: "Dewleta Tirk di encama lêgerîna xîlafeteke nû de hêza leşkerî li Başûrê Kurdistan û Iraqê bi cih kiriye. Ev hêz ji bo parastina desthilatdariya PDK'ê nayên bi cih kirin. Berovajî tiştên tê xeyalkirin, di dawiya dawî de Tirkiyeyeke nû ya bi zêdebûna eyaletan tê dîzaynkirin. Gelê Kurdistanê wek salên din li hemberî talankirin û valakirina gundan xwedî helwestin, derveyî çend kesên ku îxanetkarin û bê bertek dimînin. Bi taybet gelê Başûrê Kurdistanê helwesta xwe nîşanî dagirkeriyê didin, ji ber ku gele kurd di şoreşa Îlon û Gulanê de herî kêm du milyon şehêd li KurdIstanê dane. Hikumeta Iraqê ger destê xwe bide destê dewleta tirk û nexwedî helwest be, bê guman ger hilbijartin bêne kirin bi tu awayê sernakevin û li ser desthilatdariyê namînin. Bêdengiya hikumeta Iraqê ji aliyê gel û saziyên Iraqê ve cihê şermezariyê ye."

**'Pêwîste gelê kurd li hemberî xiyanetê bêdeng nemîne'**

Berwarî da zanîn ku PDK'ê gelê Başûrê Kurdistanê aniye asta radestkirina dewleta Tirk û çeteyên wê, lewma pêwîste dijî vê yekê berxwedaneke pir mezin hebe û gotinên xwe wiha bidawî kirin: "Pêwîste gelê me yê Başûrê Kurdistanê yê welat û niştîmanparêz jibîr neke ku dijî rejîma Baas a Saddam bi rojan berxwedanî kirine. Divê gelê Başûr li dijî van kiryaran bêdeng nemîne û biherike qadan. Girînge helwesta gelê me yê Kurdistanê bi giştî wisa be. Ji ber ku ev ne tenê pirsgrika rêxistin û sazîyekê ye, ya giştî gelê Kurdistanê ye."

# TEV-DEM`ê banga mezinkirina têkoşînê û birêxistinkirinê kir

**Navenda Nûçeyan**

TEV-DEM`ê ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê û bidestxistina azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan banga mezinkirina têkoşînê, berxwedanê û birêxistinkirinê li ser bingeha şerê gel ê şoreşgerî kir.

Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bi nêzîkbûna salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê re daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de ev bone li Rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd, pêkhateyên herêmê, malbatên



şehîdan, birîndaran, têkoşeran û hêzên parastinê hate pîrozkirin.

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku di Şoreşa 19'ê Tîrmehê ya ku ji Kobanê sala 2012`an dest pê kiriye de, gelek destkeftî hatin bidestxistin û hêviyên gelên herêmê vejandin.

Hate destnîşankirin ku Şoreşa 19`ê Tîrmehê, li herêmê û cîhanê tecrubeyeke gelek girîng e, tê de guheritnên mezin li ser astên civakî, çandî, siyasî û parastinê çêbûn û jin û ciwan rola xwe ya pêşeng lîst ta ku Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ava bû û bû hêzeke siyasî û civakî ya çalak û hîna têkoşîneke girîng dimeşîne û ji bo parastina destkeftiyên vê şoreşê gelek fedakarî kirin û hîna dike.

Her wiha di daxuyaniyê de behsa helwesta dewleta Tirk a dagirker hate kirin ku bi awayekî hovane êriş kir, şert û mercên navneteweyî bi kar anî ji bo ku vîna şoreşê têk bibe û di wê oxirê de siyaseteke derqanûnî û ji bo ku tola xwe ji gelê herêmê hilîne, li ser Rêber Abdullah Ocalan meşand û wî ji gelên berxwedêr û têkoşer dûr xist.

Di daxuyaniyê de îşaret pê hate kirin ku ev pêvajo çarenûsî ye û di vê demê de hikumeta Erdogan şerê dagirkirinê li dijî Başûrê Kurdistanê ragihand û li aliyekî din hewl dide bi rejîma Sûriyeyê lihev were û armanca wê ya sereke dagirkirina xwe rewa bike û vîna gelê herêmê û şoreşa 19`ê Tîrmehê têk bibe.

Di dawiya daxuyaniyê de bang li gelê herêmê hate kirin ku bi girseyî tev li şahiyên Şoreşa 19`ê Tîrmehê bibin û bi awayekî berpirs li hember siyasetên qirkirinê yên li dijî Rêber Abdullah Ocalan bisekinin, piştgiriya pêngava navneteweyî bikin ku ji bo bidestxistina azadiya wî ya fîzîkî hatiye ragihandin, her wiha têkoşînê, berxwedanê û birêxistinkirinê li ser bingeha şerê gel ê şoreşgerî mezin bikin ji bo ku mîrasa dîrokî biparêzin û rê li pêşiya dagirkeran, xayînan bigirin.



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê wê bi têkoşîna jinên ciwan tacîdar bibe

Jinên ciwan yên Rojavayê Kurdistanê salvegera şoreşa Rojava ya 12'e mîn pîroz kirin û gotin: "Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo tavahî gelên azadîxwaz û bi taybet jinan weke vejîneke nû bû ku bi hêviya bingeha rizgarkirina tevaî jinan û axa Kurdistanê ye, her wiha îro jina ciwan buye rihê Şoreşê."

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Di nava têkoşîna 12`e salan de jinên ciwan di nava şoreşê de şoreşa azadiya jinê dan destpêkirin, bi taybet li hember hişmendiya zilamparêz û desthilatdariya dewlet û civakê şerê îsbat kirina hebûn û nasnameya xwe dan meşandin. Li ser xeta doza azadiya jin bi bedelên giran jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di milê civakî, dîplomasî, aborî, çandî û leşkerî de xwe îsbat kirin. Jinên Kurd bi fikirên netewa demokratîk û azadîxwaziya jin, ji bo jinên pêkhateyên ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin xebatên gelek mezin dan meşandin û bi hev re gavên pîroz di dîrokê de dan avêtin.

Derbarê salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê û pêşwazîkirina wê Endama Jinên ciwan Nadiya Yusif û Endama ciwanên PYD'ê Sandira Şerîf ji Rojnameya me re axivîn.

**'Şoreşa Rojava şoreşa vejîna gelê Kurd e'**

Nadiya Yûsif diyar kir ku şoreşa Rojava şoreşa vejîna jinê ye û wiha got: "Di sedsala 21 emîn de gavên mezin û yên pîroz ji bo gelê Kurd hatin avêtin di giştî cîhanê de Kurdan bi felsefeya Rêber Abdullah Ocalan di serdema nûjen de careke din muhra xwe li dîrokê xistin. Ev gav bi riya hilbijartina xeta sêyemîn di aloziya Sûriyê de hatin pêşxistin. Careke din jin bi hêza xwe û bi bedelên giran di şoreşê de xwe îsbat kir û bû mînaka şoreş û şoreşgerên cîhanê. Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo tavahî gelên azadîxwaz û taybet gelê Kurd weke vejîneke nû bû ku bi hêviya bingeha rizgarkirina tavahî axa Kurdistanê. Her wiha şoreşê derfet da jinên Ereb ku li dijî kevneşopî û adetên kevnepeprest ên ku mafên wan binpê dike, li ber xwe bidin. Jin bi awayekî rasterast û bi bandor beşdarî serkeftina şoreşê bûn. Jinan roleke mezin di pêşxistina projeya xweser a jinan de lîstin. Ev tê wê wateyê ku wekhevî li ser erdê tê kirin, berevajî welatên ku doza demokrasiyê dikin û beşdarbûna jinan di biryardanê de fermî dimîne."

**'Bi saya fikirê Rêber Apo jin nefes stanad'**

Endama Jinên ciwan Nadiya Yûsif di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em wekî jinên ciwan şoreş ji bona me tê çi wateyê? Di serî de şoreş xilasiya zihniyeta dijbere, rizgarkirina Jinane, xilasiya fermana ya ku li ser civakan de tê. Bêguman em wek jin me di qonaxekî de jiyan dikir ku mafê me bi her awayî hatibû xwarin, em di bin bêdengiyê de hatibûn hiştin. Lê ji berhemdayîna felsefeya Rêber Apo me karî careke din hêza ku ji me hatibû dizîn vegerînin, her wiha berheman li derdora xwe bidin avakirin. Yanî dikarim bibêjim bi saya fikirê Rêber Apo me karî ku bêhinê bistînin û bi vî awayî xwe isbat bikin, me ji her kesî re got kes nikare fikirê Jina azad bê bandor bike. Ji lewra ya ku dikeve ser milê me jî ew e ku em bikaribin vî fikirî hem li Rojhilata Navîn û hem jî li cîhanê belav bikin û ji tevahî jinan re bibin mînak. Wekî yekîtiya Jinên çiwan di vî alî de xwedî îradene û emê bi riya serkeftinê bi israr bin. Em salvegera şoreşa 19`ê Tîrmehê li tevahî jinan pîrozdikin."





**Nadiya Yusif**

**'Rola jin di şoreşê de'**

Di heman çarçoveyê de Endama ciwanên PYD'ê Sandira Şerîf da zanîn ku manedayîna me ya şoreşê her roj zindî dibe. Ji ber ku hêza xwe bi destxistin û wiha goit: "Di Şoreşa 19`ê Tîrmehê de jin îradeya xwe derxistin holê û me xwe isbat kir. Her wiha jin cihê xwe di hemû qadan de girt û bi rolekê pir xurt û aktîf leyist. Niha dema ku em li dewletê meyze dikin Jin her tim buye amûrekê ne baş û her kes bi kêfa xwe wê dibe û tîne, Yanî dikarim bibêjim ku bi darê zorê kirasê koletiyê lê hatiye kirin û di asteke gelek mezin de jî wê li ser xwe qebûl kirye. Lê bi avabûna şoreşa jin berhem da û xwedî li xwe derket."



**Sandira Şerîf**

**'Parastina destkeftiyên şoreşê erka me ye'**

Sandira Şerîf di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Di fikir û frelsefeya Rêber Abdullah Ocalan de her azadiya jin esas girtiya Rêber Apo dibêje ku 'Jin azad nebe wê civak jî azad nebe'. Her tiştî divê em destkeftiyên şoreşê yên ku girîngiyê dide azadiya jinê, biparêzin. Ne tenê li eniyên sînor, li hundir û derveyî civakê têkoşînek heye. Bi taybet li dijî çanda jinê û destkeftiyên ku di şoreşê de bi dest xistine şerek heye. Ji bo bidestxistina azadiya xwe me rêyeke dûr û dirêj derbas kirî ye, ji lewra parastina destkeftiyên şoreşê erkê me ye, ji ber ku îro jina ciwan buya rihê şoreşê."

# Malbatên şehîdan: Şoreşa Rojava şoreşa azadiyê ye

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Malbatên şehîdan diyar kirin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo gelên bindest şoreşa azadiyê bû, bi saya felsefeya Rêber Apo, keda şervanên azadiyê û xwîna şehîdan destkeftiyên giranbuha hatin qezenckirin. Herwiha malbatên Şehîdan tekez kirin ew ê hertim li ser şopa şehîdên heqîqet û azadiyê têbikoşin.**

Şoreşa 19'ê Tîrmehê, dikeve sala xwe ya 12'an, ji bo kurdên Rojava, herwiha gelên Sûriyê bi giştî şoreşeke nimûneyî li ser asta cîhanî ye. Bi hizir û felesefeyeke kûr, bi çirûska çekê heqiyê û hêza jin, xort kal û pîran di sala 2012'an de dest pê kir. Tevî astengî û êrişên çete û dewletên desthilatdar û hegemon, ev şoreş bû destkeftiyek bi nirx, bi saya şehîdan heta roja îro, hîna li ber xwe dide û didome.

Di derbarê salvegera 12'mîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê, malbatên şehîdan yên bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

**'Şoreşa Rojava derfeteke dîrokî ye'**

Endama Meclisa Malbatên Şehîdan, Xêriya Hesen anî ser ziman ku Şo-



**Xêriya Hesen**

reşa 19'ê Tîrmehê ji bo gelê kurd û pêkhateyên din re derfeteke dîrokî ye û wiha got: "Dema ku Şoreşa Rojava dest pê kir, di heman demê de Buhara Gelan li gelek welatên erebî dest pê kiribû ji wan dewletan Sûriyê bû. Li Sûriyê serhildanek li dijî rêjîma wê demê hat destpêkirin û hêzên qaşo xwe dikin rikberên hikumeta Şamê şerek dest pê kirin. Me weke qada sêyem xeta şoreşa xwe da meşandin, parastina xaka xwe kir. Di pêşveçûna vê şoreşê de me êrişî tu aliyan nekiriye, lê belê me civak bi rê ve bir û civak ji desthilatdariya rêjîma wê demê rizgar kir. Netewa kurd di ber qirkirinê de bû, rêjîma desthilatdar siyaseta pişaftinê dida meşandin. Pêkhateyên din ji bilî yên kurd jî mîna suriyan, aşûr, ermen û hwd… ji mafê xwe bêpar mabûn. Lê bi destpêkirina şoreşê re, êdî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji wê zilm û zordariya hatin rizgarkirin, ji ber vê yekî jî Şoreşa Rojava ji bo gelên Sûriyê bi giştî derfeteke dîrokî bû. "



**Cîhan Gulo**

**'Şoreşa 19 Tîrmehê şoreşa azadiya jin, civak, ziman û çandê bû'**

Xêriya Hesen diyar kir ku Şoreşa Rojava jin, civak, çand û zimanê kurdî azad kir û wiha domand: "Berî ku Şoreşa Rojava dest pê bibe, gelên Sûriyê û bi taybet gelê kurd ji ziman, çand û hemû mafê xwe bêpar bûn. Bi derketina şoreşê re sûdeke mezin li gelê kurd hat kirin ku destpêkeka qonaxeke nû ji bo gelê kurd hat afandin û dîroka kurdan, ziman, nasname û çanda kurdî bi cîhanê jî da naskirin. Ev qonaxa nû ya li ser fikr û felsefeya Netewa Demokratîk nefes da civakê, di serî de jin ji hişmendiya malbat û dewlet hat rizgarkirin. Bi vî awayî jina kurd li nik zilamê kurd xwe bi rêxistin kir û sîtstema hevseroktiyê hat çêkirin. Jina kurd li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi berxwedaniyekê kir xwe di hemû waran de, weke milê siyasî, aborî, civakî û hwd… li pêş xist, nexasim di aliyê leşkerî de. Berxwedaniya YPJ'ê ya ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de yê li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê da meşandin, berxwedaniyeke efsûnî bû û hişt cîhan bejna xwe li hemberî vê berxwedanî û vîna jinên kurd bitewîne. "

**'Felsefeya Rêber Apo bandor li tevahiya cîhanê kir'**

Rêveberiya Qomîteya Jinê ya Meclisa Malbatên Şehîdan Cîhan Gulo dest nîşan kir ku hizr û ramanên Rêber Apo bandora xwe li gelên cîhanê kir û wiha axivî: "Bi boneya salvegera Şoreşa Rojava em şoreşa xwe, li Rêber Apo, şehîdên azadiyê, têkoşer, gelê kurd û hemû gelên azadîxwaz pîroz dikin û sersaxiyê ji malbatên şehîdan re dixwazin. Birastî Şoreşa Rojava li gorî şoreşên cîhanê yên ku berî niha hatine destpêkirine şoreşeke nimûneyî ye, ji ber ku xwedî rêgez, felsefe, nirx û îdiyolojiyeke cuda bû. Vê şoreşê li ser xeta şoreşgerî ya îdiyolojî Tevgera Rizgeriya Kurdistanê û felsefeya Rêber Apo meşa azadiyê dest pê kir. Di pêşveçûna şoreşê de roj bi roj serkeftinên dîrokî weke destkeftiyên nirxbuha bi saya şehîdan û şervanên me dihatin qezenckirin. Lewma jî dengvedaneke mezin li ser asta cîhanê çêkir, ne tenê li Sûriyê û Rojhilata Navîn, lê belê gelên cîhanê tev ketin bin bandora Şoreşa Rojava û felsefeya Rêber Apo. "

**'Em pişta xwe nadin şehîdên azadiyê'**

Cîhan Gulo bilêv kir ku ew ê hertim li ser xeta heqîqet û azadiyê bimeşin û wiha axivî: "Bê guman Şoreşa Rojava tevî ku astengiyên derdikevin pêşiya me, êriş û gefên li ser herêma me tên kirin dîsa jî berdewam e. Di dema heyî de hemû hêzên desthilatdar bi taybet dewleta Tirk bi hemû hewldanên xwe dixwaze vê şoreşê têk bibe. Rojane êriş, û kiryarên dagirkeriyê tên kirin, li aliyekî din jî çeteyên DAIŞ'ê jî bi saya dewleta Tirk tevdigerin, armanc ji vê yekê jî têkbirina şoreşê û destkeftiyên wê ne. Lê şoreşa ku gelên wê bi saya wê ava azadiya vexwarine, wê ticarî bêdeng nemînin li hember êrişên ku li ser herêmê tên kirin. Her bostek ji axa Rojava û Kurdistanê tevî bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Lema jî eger pêwîst bibe, ne tenê li Rojava em ê têkoşînê ji bo axa xwe bikin, lê belê li her çar parçeyên Kurdistanê axa pîroz biparêzin. Em ê hertim bi hizir û ramanên Rêber Apo kar û xebatê bikin û heya nefesa dawî em ê li ser şopa şehîdên azadiyê bin. "